Bihayê xiyantê

Dêjîn Mihemed

Rojekê ji roja balindekê qelew kefite di bwîsa nêçîrvanekî da, û hemî xwarina di wê bwîsê da xwar, û neşiya ji wê bwîsê derkevît, demê nêçîrvan hatî û ew balindê qelew di bwîsa xo da dîtî gelek keyfa wî hat, belê wî balindey dest bi hîvî û rica ji nêçîrvanî kir da wî berdet, û soz danê beramber berdana xo ew berê hevalên xo bidete bwîsa nêçîrvanî, belê nêçîrvanî ew balinde girt û berneda û gotê: Eger tu vî tiştî bikey tu ji hejî mirinêy; çunkî tu balindekê bê bextî, û xiyanetê li hevalên xo dikey. Û bi vî rengî nêçîrvanî ew balinde bire mala xo daku bibirêjît û .bixot